

Vaksîneya Vîrûsa Korona

- Comirnaty (Pfizer/BioNTech)

Agadarî dema radestkirina ev vaksînê ji we re

Korona vîrûsa nû dibe sedema enfeksiyona dezgeha nefesê. Gelek kes nîşanên sivik yan bêy nîşan tecrûbe dikin, lê dibe ku hin kes bi giranî nexweş bikevin. Kesên pîr û kesên ku berê nexweşiyên din ên taybetî hene, di bin rîska nexweşiya giran an mirinê de ne. Vaksîneya korona pêşî ji tûşîbûna nexweşiya Kovîd -19 digire. Armanca serekiya vê parastina jiyana û tenduristiya merovan e.

Divê kî vaksîneya vîrûsa korona bistîne?

Vaksîneya vîrûsa korona ên ku bi Bernameya Parêzbandiya Neteweyî ve têne radest kirin ji kesên ku li Norwêcê dijîn re berdestin. Vaksîn belaş e û lêdayina vê vebijarkê ye.

Ez çawa dikarim vaksîneyê bistînim?

Ji bo bidestana agahdariyan li ser kesên ku têne vaksîn kirin, çawaniya organîze kirina vaksîneyê û dema pêkanîna vê, serdana malpera şaredariya xwe bikin.

Vaksînekirin çawa pêk tê?

Vaksîn di milî de tê lêdayin. Berî vaksînebûnê, ji we tê pirsîn ka hûn xwe baş hîs dikin û we li hember vaksînebûnê din ên ku we berê wergirtine, bertek hebûne yan na. Eger hûn tûşî Kovîd-19 ê bûnê an we berê vaksîna vîrûsa korona wergirtiye, hûn ducanî ne, alerjiya we heye, dermanî bikar dînin an nexweşiyên weyên din hene, bêguman ragehînin. Rêbernameyên li ser hejmara guncan û navberan ji bo koma xwe bişopînin. Navenda vaksîne lêdanê dikare di vê yekê de ji we re bibe alîkar. Pêdivî ye ku hûn dozan di wextê diyarkirî de bistînin. Eger nexweşiyek weya bi şidet hebe û taya we ji 38° C zêdetir be bi gelemperî vaksîne lêdanê tê paşve xistin. Piştî vaksîne lêdanê, ji we tê xwestin ku hûn herî kêm 20 deqeyan li cîhê vaksîne lêdanê bisekinin.

Ev vaksîne çawa dixebite?

Di vaksîneyê de şêwenameyek (peyamnêra RNA) ji bo komikên virusa korona heye. Bêy guhertoyên bê zirar ji van komikên hilberîn dike ku pergala parastinê dikare li ser wan bixebite. Bi vî rengî, pergala parastinê hîn dibe ku komên korona vîrûsê nas bike û eger laş tûşî vîrûsê bikeve, dikare leşî biparêze. Peyamnêra RNA ji aliyê laş ve bilez tê parçe kirin û li ser materyalê jenetîkî ti bandor tune.

Di vê vaksîneyê de vîrûsa zindî tune û nabe sedema nexweşiya Kovîd-19. Vaksîneya korona vîrûs pêşî li nexweşiyê digire. Lê ew nikare nexweşiyê derman bike.

Pêştir ev rêbaza amadekirina vaksîneyê ji bo nexweşiyên vegirtî di merovan de nehatibû bikar anîn, lê ev teknolojiya hatiye naskirin û ji bo dermankirina penceşêrê tê bikar anîn.

Ev vaksîn dê çiqas bi bandor be?

Ev vaksîne laşî li hember nexweşiya bi sedema korona vîrûsa nû, diparêze. Asta parêzbendiyê li hember cureya *girana* nexweşiyê piştî vaksîna dozên yekem û duyemîn bilind e. Du dozên vaksîne lêdayinê hewce ne ku hûn li hember vîrûsa korona berevaniya kêrhatî bistînin. Em hîn jî nizanin ka ev ewlehî dê heta kengî bidome. Eger asta parastinê bi derbasbûna demê kêr bibê, dibe ku dozêk bîrhîner hewce bibê. Vaksîn li hember belavbûna nexweşiyê parêzbendiyê bêkêmasî radest nakin. Ji ber vê yekê, divê hûn her gav pêşniyarên heyî yê bo kontrolkirina nexweşî bişopînin.

bandorên kêlekî

Piraniya bandorên kêlekî di nav çend rojên yekem de piştî vaksîne lêdanê çê dibin. Vaksînên vîrûsa korona li hember vaksînên din bandorên pirtir ên hevpar hene. Bi giştî nîşan sivik û navgîni in û piştî çend rojan winda dibin, lê hin kes nîşanên girantir tecrûbe dikin. Bandorên kêlekî bi giştî di kesên ciwan de ji yê pîr hinekî girantir in.

Piraniya kesên vaksîne bûyî li cîhê derziyê êşê dikişînin. Bandorên neyênî yê hevbeş ên din pêk tên ji bêhêzî, serêş, êşa masûlkan, lertzîn, êşa masûlkan û tayê. Ev bandorên kêlekî piştî doza duyemîn pirtir in.

Bandorên kêlekî yê giran pirkêm in. Bandorên pirkêm pêk tên ji iltîhaba dil (mîokarditis û perîkarditis). Ev bandorên kêlekî bi giştî piştî doza 2 û pir caran di ciwan û mezinan de derdikevin. Eger ev bandorên pirkêm ên wekî reaksiyonên alerjîk ên dijwar û iltîhaba dilî derkevin, ew dikarin bibe derman kirin. Em nikarin bandorên kêlekî û nediyar yê pirkêm, an bandorên kêlekî ku tenê piştî vaksîne lêdanê xuya dikin, nemuhtemel bizanin.

Eger min bandorên kêlekî hebin, divê ez çi bikim?

Eger we nîşanên nediyar, giran, an domdar hebin, ji bo nirxandin û şêwirmendiyê bi doktorê xwe an pisporek tenduristiyê yê din re têkilî daynin. Bêyî ku hûn bifikirin ku nîşan ji vaksîne lêdanê re têkildar in an na, vê bikin. Pisporek lîstîna tenduristiyê berpirsyare ku her bertekên tûnd an bêhêvî yê ku ew guman dikin ku ji ber vaksîneyê ne, ragihîne. wekî din, hûn bixwe dikarin bi rêya helsenorge.no agahdariyek bişînin.

Erêkirina Bişert

Vaksîneya korona vîrûs di lêkolînek mezin de ku tê de çend hezar kesên vaksîne wergirtin hate ceribandin. Ev lêkolîn bi eynî şêweya vaksîneyên din pêk hat, lê dema çavdêriyê di vê de kurttir e. Rayedarên çavdêr li ser demanan ji vê vaksîneyê re erêkirina bişert dayine. Bi gotinên din, têra xwe dane hene ku nîşan dike ku sûdên vê vaksîneyê ji rîskên vê zêdetir in, lê hilberînerê vaksîneyê divê lêkolînan bidomîne û her gav ku daneyên nû peyda kirin, bi domdarî wan pêşkêşî rayedarên çavdêr li ser dermanî bike.

Min kîjan vaksîne vergirtiye?

Dema ku vaksîneya korona vîrûs ji were radest bibê, ew ê li Nivîsgeha Qeyda Parêzsaziya Norwêcê, SYSVAK, were qeyd kirin. Hûn dikarin li helsenorge.no agahdariyên xwe bidest bînin.

Hûn agahdariyên bêtir dixwazin?

Ji kerema xwe ji [bijjka](https://www.bijjka.no)/ê xwe an pisporek tenduristiyê din bipirsin an serdana malpera Enstîtuya Tenduristiyê Norwêcî li [fhi.no/cip](https://www.fhi.no/cip) bikin.